# BUROYA KURDÎ
# ya Pêwendî û Agahdariyê

**Bultena agahdariyê - N° 50 Hezîran 2009**
Quai aux Pierres de Taille 11, 1000 Bruxelles - Tél. 02 219 80 60 - www.kurdishbureau.be- kurdishbureau@scarlet.be

www.arsivakurdi.org

## XEBATA BUROYA KURDÎ

### GULAN 2009

**KONFÊRANS**

***18.05.2009*:„Biryar - Çarçeve li dijî Nijadparêziyê“ ya Konseya Yekîtiya Ewropî**
François Sant'Angelo, huqûqzan li Navenda ji bo Wekheviya Bextan û Têkoşîna li dijî Nijarparêziyê, kurteya „Biryar-Çarçeve li dijî Nijadparêziyê“, ku ji aliyê Konseya Yekîtiya Ewropî di 28 Teşrîn 2008 de hat stendin, got.



Wî got ku amanca wê nêzîkkirina zagonên (qanûn) welatên endam ên li ser nijadparêziyê ye û ku piştî du salan divê ku ev welat zagonên xwe li gora vê biryarê biguherînin, eger na ewê bên ceza kirin :

*„Ji bo ku hin zorî di hevkariya di warê dadiyê (adalet) de hene; loma pêwîst e ku zagonên cezayî yên Dewletên endam bêtir bên nêzîkkirin, ji bo dabînkirina (te'mînkirin) zagoneke zelal û tam, ji bo têkoşîna xurt nijadparêziyê“.*
Fr. Sant'Angelo weka nimûne zagona li ser inkarkirina nijadkujiyê (négationnisme) li Beljîka da : bitenê nijadkujiya (qetliam) Cihû û Qereçiyan ji aliyê Hitler hatiye nas kirin. Nijadkujiyên ermenî, tutsi, kurdî ji aliyê Saddam Huseyn ... ne hatine nas kirin.



# NÛÇE JI KURDISTANÊ

## Gulan 2009

## KURDISTANA TIRKIYÊ

**DOZA ERGENEKONÊ (DUMAHÎK) :**
(Li bultenên me yên buhurî binêre)

***RAPPORA AMERÎKA LI SER ERGENEKONÊ***
***Di Gulan 2009 de***, Amerîka ERGENEKON xist rappora xwe ya li ser têrrorîsmê. Rappor dibêje ku ev rêxistin ji berpirsiyarên kevn ên leşkerî yên tirk, burokrat, rojnamevan, ramyar (siyasetvan) û hin kesên ne paqij ava bûye. Û ew dibêje jî ku ji 2007 heta dawiya 2008 vekolînek (ankêt) li ser wê hati bû kirin û ku gûmanbar (kesên bi şubhe) bi têrrorîsmê hatine tawanbar (bi sûc) kirin.
*(netkurd.com, 01.05.2009)*

***BÎRÊN MIRINÊ***
***Di 06 Gulan 2009 de***, hestiyên mirovî û perçeyên solên şewitî li erdekî nêzîkî buroya servîsên dizzî yên tirkî, MIT, hatin dîtin û hatin şandin servîsa tibbê dadiyê ji bo ku bên tehlîl (analyse) kirin.
*(netkurd.com, rizgari.org, serwext.com, 07.05.2009)*

***Di 11 Gulan de***, li gora danezana barroya Batmanê, hestiyên mirovî, cill û sol li 6 ciyên cihê hatin dîtin.
*(netkurd.com, avestakurd.net, rizgari.org, 12.05.2009)*

***ÇEKÊN VEŞARTÎ***
***Di 10 Gulan 2009 de***, çek li bin derya, li taxa Beykozê, li Istanbûlê, hatin dîtin ! Polîs lêgerîna xwe dajo.
*(netkurd.com, avestakurd.net, serwext.com, 11.05.2009)*

**MANGIRTINA BIRÇÎBÛNÊ YA PARTIYA DTPê**
***Di 02 û 03 Gulan 2009 de***, berpirsiyar, parlementer û şaredarên partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye, DTPê, mangirtineke (grêv) birçîbûnê li bexça Koşuyolu ya Diyarbekirê kir, ji bo riswakirina (protêsto) ragirtinên girseyî yên endamên partiya xwe (li bultena me ya buhurî binêre). Bi hezaran kes piştgiriya wê kir.
*(netkurd.com, avestakurd.net, rizgari.org, nefel.com, 03.05.2009; Milliyet, rudaw.net, 04.05.2009)*

**OLLI REHN Û SEROKÊ TIRK PÊŞWAZIYA AHMET TÜRK DIKIN**
***Di 05 Gulan 2009 de***, kommîserê ewropî yê berpirsiyarê Firehkirina Yekîtiya Ewropî, Olli Rehn, pêşwaziya serokê partiya kurdî DTPê, Ahmet Türk, kir. Û evê dawîn beşdar bû civîneke koma Çep a Ewropî ya Yekbûyî, li Parlementa Ewropî.

***Di 06 Gulan de***, serokê tirk, Abdullah Gül, jî pêşwaziya Ahmet Türk kir.
*(netkurd.com, avestakurd.net, rizgari.org, 07.05.2009)*

**ŞAREDAREKÎ KURD TÊ TAWANBAR KIRIN**
***Di 05 Gulan 2009 de***, dadgeha 5mîn a cezayî şaredarê Surê, yek ji şaredariyên Diyarbekirê, Abdullah Demirtaş, bi 2 sal û 6 meh zîndan tawanbar kir, ji bo ku wî di 07 Tîrmeh 2008 de di hevpeyvîneke li kanala têlêvîzyona kurdî, Roj TV, de goti bû "*Mîrza Öcalan*".
*(avestakurd.net, 06.05.2009)*

**ENDAMÊN PARTIYA KURDÎ DTPê TÊN RAGIRTIN (DÛMAHÎK)**
***Di 12 Gulan 2009 de***, polîsê Konya seroka şaxa Konya ya partiya DTPê, Banû Ayfer Yılmaz, û 12 xwendekarên kurd ên zanîngeha Selçûkê, li Konya, ragirtin. Ew bi endambûn û propaganda PKKê hatine tawanbar kirin. Ev ragirtin beşek ji tevgereke mezzin li dijî vê partiyê ne (li bultena me ya buhurî binêre).
*(netkurd.com, 13.05.2009)*

**CARDIN PÊTROL LI KURDISTANÊ**
***Di 13 Gulan 2009 de***, birêvebiriya navçeya Semsûrê (Adıyaman) ya şirketa pêtrolê TPAO da zanîn ku wê pêtrol li Doğubaşpınarê, li navçeya Adıyamanê, li Kurdistana Tirkiyê dit. Karên lêgerînê berê sê mehan dest pê kiri bû.
*(rizgari.org, 14.05.2009)*

**NAVÊN KURDÎ YÊN SÊ BEXÇEYAN NE HATIN PEJIRANDIN**
***Di Gulan 2009 de***, muxtarê Kayapınarê navên kurdî, Roşna, Şîlan û Rojda, yên ku li sê bexçeyan hati bûn kirin ne pejirandin (qebûl ne kirin). Şaredarî hawar ji dadgeha idarî ya Diyarbekirê xwest, lê dadgehê xwestina wê ne pejirand.
*(Hürriyet, netkurd.com, 14.05.2009)*

**ÊRÎŞ LI DIJÎ KURDAN**
***Di 19 Gulan 2009 de***, Kurdek ji aliyê faşîstên tirk "Ülkücü", li Akyazıyê, li navçeya Sakarya, li Tirkiyê, hat kuştin û du jî hatin birîndar kirin. Ev yek piştî hewayekî ne xweş ku deh rojan ajot.

www.arsivakurd.org

***Berê 10 rojan***, serokê faşîstan "Ülkücü", Talip Aksoy, û Kurdek hati bûn kuştin.

***Di 4 salan de***, Kurd 6 caran ji aliyê van faşîstan hatin "lînç" (êrîş) kirin.
*(netkurd.com, 20.05.2009)*

**KUJERÊ KURDAN TÊ TAWANBAR KIRIN**
***Di 19 Gulan 2009 de***, dadgeha Malatya, li Kurdistana Tirkiyê, Tirkek, Tanju Çavuş, bi 8 sal û 4 meh zîndan tawanbar kir. Di 2005 de, Çavuş li Şemzînanê Kurdek kuşti bû û 5ên din jî birîndar kiri bûn. Di destpêkê de wî hukmê muebbed stendi bû, lê piştre ew hat sivik kirin.
*(serwext.com, 20.05.2009)*

**PÊŞANGEHEKE IRAQÎ YA BAZARGANIYÎ LI KURDISTANA TIRKIYÊ**
***Di 23 Gulan 2009 de***, Pêşangeha 4mîn a Bazarganiyî û Pîşesaziyî (sinaî) ya Navneteweyî ya Iraqê li Entabê, li Kurdistana Tirkiyê, hat vekirin. Nêzîkî 700 şirketên çend welatên Rojhilata Navîn, Ewropa û Asya beşdarî wê bûn. Ji Kurdistana Iraqê, şandeke odeyên bazarganî û pîşesaziyê yên Duhok, Hewlêr û Suleymaniyê, û şirketên bazarganiyî, beşdarî wê bûn.
*(netkurd.com, 24.05.2009)*

**700 ZAROKÊN KURD DI SALEKÊ DE TÊN RAGIRTIN**
***Di Gulan 2009 de***, Rêxistina Mafên Mirov li Tirkiyê rappora xwe ya 2008 weşand û tê de got ku di vê salê de 700 zarokên kurd, ku ji wan 400 li Diyarbekirê, hatin bin çav kirin, lê xistin û êşkence kirin. Hin ji wan cezayên 25 sal zîndan, ji bo ku wan di xwepêşandan de kevvir avêtin polîsan, stend.

Li gora heman (eynî) rêxistinê, di 2007 de ji 1.572 zarokên kurd bêtir hati bûn ragirtin û êşkence kirin.
*(serwext.com, 26.05.2009)*

**RAPPORA AMNESTY INTERNATIONAL**
***Di Gulan 2009 de***, Amnesty International rappora xwe ya 2009 weşand. Ew tê de dibêje ku li Tirkiyê êrîş, êşkence û lênêrîna xerab a Kurdan bêtir bûye.

Eger em werin mafên mirov, rappor dibêje ku guherandinên bend 301 a zagona tirkî têr nakin û ku bendên din azadiya ravekirinê dipelixînin. Û ew bi ser de jî dibêje ku hîn mercên (şart) girtinê li zînanên tîp F baştir ne bûne.
*(peyamner.com, 28.05.2009)*

## ÊRÎŞ LI DIJÎ KURDAN LI QIRGIZISTANÊ

**DANEZANA HUKÛMETA KURDISTANA IRAQÊ**
Piştî êrîşa çend send Qirgizên nijadparêz li dijî Kurdan (li bultena me ya buhurî binêre), berpirsiyarê pêwendiyên derve yê Hukûmeta Herêma Kurdistana Iraqê, Fellah Mustafa, nameyek ji serokwezîrê qirgiz, Kadirbeg Srbaev, re nivîsî û tê pêşniyar kir ku hukûmeta wî pê re hevkariyê bike ji bo ku vê pirsê bi hev re çare bikin.
*(netkurd.com, avestakurd.net, 06.05.2009 ; kurdistan-news.net, 11.05.2009 ; netkurd.com, avestakurd.net, rizgari.org, efrin.com, 12.05.2009)*

## KURDISTANA IRAQÊ

**ŞANDEYEK LI KURDISTANA TIRKIYÊ**
***Di 01 Gulan 2009 de***, şandek bi serokatiya alîkarê parêzgarê (walî) Hewlêrê, Tahir Abdullah Osman, çû Diyarbekirê ji bo pîrozkirina şaredarê wê, Osman Baydemir, ku di hilbijartinên şaredariyî yên li Tirkiyê de bi ser ket.
*(avestakurd.net, rizgari.org, 01.05.2009)*

**1200 ŞIRKETÊN JI TIRKIYÊ LI IRAQÊ KAR DIKIN**
Serokê odeya bazarganiyê ya Diyarbekirê, Galib Ensari, da zanîn ku 1.200 şirketên ji Tirkiyê (tirkî û kurdî) li Iraqê kar dikin û ku 90% ji wan li Kurdistana Iraqê ne. Di 2008 de, kara wan li Iraqê gihajti bû 6 milyar dolar.
*(peyamner.com, 02.05.2009)*

**TAWANBARKIRINA BOMBEKIRINÊN TIRKIYE Û ÎRANÊ**
***Di 01 Gulan 2009 de***, 70 parlementerên iraqî danezanek wajo (imza) kir, tê de bombekirina Kurdistana Iraqê ji aliyê Tirkiye û Îranê tawanbar kir û ji hukûmeta iraqî xwest ku alîkariya malbatên qurban, li gora bend 525 a destûra iraqî, bike.
*(peyamner.com, 02.05.2009)*

***Di 03 Gulan de***, serokwezîrê Kurdistana Iraqê, Nêçîrvan Berzanî, jî di danezaneke nivîskî de ev bombekirin tawanbar kirin.
*(peyamner.com, nefel.com, 03.05.2009)*



www.arsivakurd.org

**ÊRÎŞ LI NAVÇEYÊN KURDÎ YÊN EREBKIRÎ**
***Di 01 Gulan 2009 de***, erebeke bombekirî li ser riyeke sereke li nêzîkî Kerkûkê teqiya. 3 kes hatin kuştin û 2 jî birîndar kirin. Serokê polîsê vê parêzgehê, Turhan Yûsuf, got ku terrorîst sûrî bû.
*(peyamner.com, 02.05.2009)*

***Di 05 Gulan de***, zilamên çekdar boriyeke pêtrolê li nêzîkî navenda pêtrolî ya Bayî Hesen, li Bakurê Rojhilata Kerkûkê, teqand.
*(peyamner.com, 06.05.2009)*

***Di 11 Gulan de***, piştî teqîneke ku amanca wê erebeyeke polîs li Kerkûkê bû, 8 kes, ku ji wan 5 polîs, hatin kuştin û 11 jî birîndar kirin. 3 erebe hatin şewitandin û firoşgeh (dikkan) hatin têk dan (xerab kirin).
*(peyamner.com, netkurd.com, azady.nl, 12.05.2009)*

***Di 21 Gulan de***, têrrorîstek xwe li Kerkûkê teqand. 5 kes hatin kuştin û 7 jî birîndar kirin.
*(peyamner.com, aknews.com, 21.05.2009)*

***Di 26 Gulan de***, piştî du teqînan, kesek mir û 3 kesên din birîndar bûn.
*(azady.nl, 26.05.2009)*

**ŞANDEKE DANIMARKÎ LI KURDISTANÊ**
***Di 04 Gulan 2009 de***, serokê Kurdistana Iraqê, Mesûd Berzanî, pêşwaziya şandeke danimarkî, ku ji birêvebirê giştî yê bazarganiya derve û ramyariya (siyaset) bazarganiyê li wezareta danimarkî ya karên derve, Sived Rud Nilson; balyozê (sefîr) Danimarka li Iraqê, Mikayel Wetner, û jimareke pisporan di warê abor û abazraniyê de pêk hati bû, kir.

Şande dilniya (te’kîd) kir ku ew dixwaze ku li Kurdistanê ramyariyeke jîndar (aktîf) a berhemanînê (investissement) bajo. Wê razîbûna xwe ji rewşa ewlehî û berhemanînê li vê navçê ravekir.

**ŞANDEKE RÛSÎ**
***Di 11 Gulan 2009 de***, serokê Kurdistanê, Mesûd Berzanî, û serokwezîr Nêçîrvan Berzanî, li dû hev pêşwaziya şandeke rûsî ku ji cîgirê serokê encumena pêwendiyên derve ya parlementa rûsî, Zalimxan Muçov, û konsulê rûs li Kurdistana Iraqê, Vagev Garayev, pêk hati bû, kir.

Şandê dilniya kir ku hukûmeta rûsî ewê hêsan kirinên pêwîst ji bo berhemanînên rûsî li Kurdistanê dabîn bike. Û wê got jî ku divê ku şandeke rojnamevanên rûs were Kurdistanê ji bo ku pêşveçûnên Herêma Kurdistanê ji ramana tevane re bide nasîn.

**30 BÛRSÊN XWENDINÊ LI RÛSYA**
***Di 12 Gulan 2009 de***, wezareta perwerdê ya Kurdistana Iraqê da zanîn ku ewê bûrsên xwendinê li zanîngehên rûsî, li beşên bijîjkî (tib), endazî (hendese), firrîn û rojnamevaniyê bide 30 xwendekaran.
*(peyamner.com, 13.05.2009)*

**GORÊN HEVRAYÎ**
***Di Gulan 2009 de***, serokê Buroya Mafên Mirov a bajarê Dîwaniyye, Fadil Sahir, da zanîn ku goreke hevrayî ku tê de hestiyên 100 kesên ku bi cillên kurdî hatine pêçan li Nehr Talit, li Rojhilata parêzgeha Dîwaniyyê hat dîtin. Û wî got jî ku ev qurban di 1991 de hati bûn gulle kirin.
*(peyamner.com, avestakurd.net, azady.nl, 13.05.2009)*

***Cardin di Gulanê de***, 3 gorên hevrayî yên din, ku tê de bermayiyên bi sedan Kurd hene, li Başûrê Iraqê, li navçeya El-Qadisiyyê hatin dîtin. Dibe ku ev qurban di dema nijadkujiya kurdî, Enfal, de (1987 – 1989) hatibin kuştin.
*(netkurd.com, azady.nl, 16.05.2009; peyamner.com, 17.05.2009)*

**KURDISTAN LI PÊŞANGEHEKE NAVNETEWEYÎ LI ÇÎNÊ**
***Ji 24 Nîsan heta 06.05.2009***, Pêşangeha Navneteweyî ya bazarganiyî ya Kinto li bajarê Kuanco, li Çînê, bû. Şandeyên kurdî yên Yekîtiya Anîn û Hukûmeta Herêma Kurdistana Iraqê bi standên (mase) bazarganiyî beşdarî wê bûn.

Şanda kurdî çû du bajarên din ên bazarganiyî, Şwanda û Êw, jî û kontrat bi şirketên çînî re, di warên makînên êlêktrîk, erebe, motor, bîsîklêt û destgehên avakirinê de, wajo (imza) kirin.
*(rudaw.net, 14.05.2009)*

**MASEYEKE GILOVER LI PARLEMENTA HOLLANDÎ**
***Di 13 Gulan 2009 de***, maseyeke gilover li parlementa hollandî, li ser rewşa nuha ya Kurdistana Iraqê, bû. Endamên encumena pêwendiyên derve ya odeya duyemîn a vê parlementê, kesên akadêmîk, rojnamevan û xwendekarên zanîngehên hollandî yên cihê beşdarî wê bûn.

Nimînendeyê hukûmeta Kurdistana Iraqê li bal Yekîtiya Ewropî, Burhan Caf, yek ji axaftinkeran bû. Wî li ser prensîpa fêdêralîsmê li Iraqê israr kir û pirsên Kurdistanê bi hukûmeta navendî ya Bexdadê re, ên li ser zagona pêtrolê, erkê pêşmergan, paykirina bucê (mîzaniyye) û çarenûsa navçeyên erebkirî (bend 140 a destûrê), ravekirin. Wî spasî parlementerên hollandî ku pêşniyar kir ku peykerekî nijadkujiya kurdî (Enfal/Halabca) li Den Haagê bê danîn kir.



www.arsivakurd.org

Parlementera sosyalîst, Kristina van Velzen, soz da ku ji bo danîna vî peykerî bixebite û got ku ewê parlementer tecrube bikin ku alîkariya qurbanên navçeyên têkçûyî bi derman û tiştên din bikin.

Fred Teeven, ji partiya libêral VVD, ku li dû tawanbarê hollandî Frans van Anraat (ku çekên şîmîk ji Saddam Huseyn re firoti bûn) keti bû got ku partiya wî gelek bala xwe dide Kurdistanê û ku di havîna wêbê de ewê biçe wê derê ji bo ku konfêransan li ber dadmend û dozkaran, li ser awayê çarekirina gendeliyê, têrrorîsm û tawanên din, bike.

Joel Voordewind, ji partiya sosyal-fille, got ku partiya wî bi pêşniyareke zagonî li ser inkarkirina nijadkujiyan xerîk (mijûl) e. *"Zagon nuha amade ye"*, wî got, lê wî îtîraf kir ku hin dengdana wê naxwazin, ji bo nijadkujiya ermenî jî di nav vê pêşniyara zagonî de heye, û ku Tirkiye di vê pirsê de pirr hestiyar (hassas) e. Û wî got jî ku partiya wî pêşniyar kir ku buceya alîkariya bijîjkî (tibbî) ji Kurdistanê re bê bilind kirin û ku par 5-6 milyon Euro jê re, ji bo UNCHR û Xaça Sor, hatin şandin.

Saadet Karabulut, ji partiya SP, axaftineke hestraker kir û tê de got ku *"pirsa kurdî divê ku li Tirkiyê bê çare kirin, ev yek ji bo mirovatiyê girîng e"*. Wê nemaze ragirtinên nuh en ramyariyên (siyasî) kurd li Tirkiyê rexne kirin.
(krg.eu, 14.05.2009)

**MASEYEKE GILOVER LI POLONYA**

***Di 16 û 17 Gulan 2009 de***, nimînendeyê hukûmeta Kurdistana Iraqê li Polonya, Ziyad Reûf, li Krakovî beşdar bû maseyeke gilover bi navê " Agendas for stormy times – EU Engery and Foreign Policy". Ew ji aliyê Demos EUROPA – The European Strategy Centre, Unia & Polska Foundation, British Chatham House, European Studies Centre li Zanîngeha Oxfordê û Villa Decius Association hat pêk anîn.

Kesên ramyarî (siyasî), sermayedar, nimînendeyên hukûmî, ne hukûmî û aborî, zana û rojnamevan ji Polonya û Ingilterê beşdarî wê bûn.

Mîrza Reûf axaftinek kir ji bo ku rewşa nuha ya Kurdistanê raveke. Wî ji Ewropa xwest ku bêtir bala xwe bide vê herêmê û got ku Kurd yek ji neteweyên kêm ên Rojhilata Navîn ku helwesta wan li hemberî Ewropa ya hevaltiyê ye ye û ku Ewropî divê ku bînin bîra xwe ku Kurd bêtirîn xebat kir ji bo parastina Iraqa nuh, ji bo ku ew bibe dewleteke laîk (séculaire), dêmokratîk, fêdêral û hevalê cihanê.

Di yek ji her du şevan de, hemî beşdar hatin vexwendin mala Mîrza Reûf ji bo ku xwarinên kurdî tam bikin.
*(Krg-Polonya, 22.05.2009; peyamner.com, 29.05.2009)*

**KONFÊRANSA NATO LI DEN HAAGê**

***Di 27 û 28 Gulan 2009 de***, Rêxistina Atlantîk a Hollandî, bi hevkariya Peymana Atlantîk, li Den Haagê, li Hollanda, konfêransek li ser Konsêpta Nuh a NATO kir. Gelek kesên ramyarî, dîplomat û akadêmîk beşdarî wê bûn.

Berpirsiyarê hukûmeta Herêma Kurdistana Iraqê li bal Yekîtiya Ewropî, Burhan Caf, tê de axaft û li ser êrîşên leşkerî yên Tirkiyê li ser Kurdistana Iraqê peyivî. Wî ev êrîş bi pelixandina huqûqa navneteweyî bi nav kirin û got ku ew navê NATO li cihanê têk didin (xerab dikin) (Tirkiye endama NATO ye).
*(Krg. Eu, 28.05.2009)*



**WEZÎRÊ BELJÎKÎ YÊ KARÊN DERVE LI KURDISTANÊ**

***Di 28 Gulan 2009 de***, piştî seredana Bexdadê, wezîrê beljîkî yê karên derve, Karel De Gucht, tevî şandekê çû Kurdistana Iraqê. Ew tê de rastî serokê vê herêmê, Mesûd Berzanî, û piştre serokwezîr Nêçîrvan Berzanî, hat. Li dawiyê, konfêranseke çapemeniyê ya hevrayî ya Mesûd Berzanî û Karel De Gucht bû.

Di konfêransa çapemeniyê de, Mîrza De Gucht got ku Beljîka girîngî dide Iraqê ji bo ku ew dewleteke fêdêral e, ku ji du neteweyan, Kurd û Ereb, ava bûye, û ku ji bo vê yekê wî xwest ku rastî berpirsiyarên Kurdistanê bê. Û wî got jî ku divê ku pirs li gora destûra iraqî bên çare kirin û ku Beljîka dikare pêwendiyên aborî bi Kurdistanê re bike.
*(peyamner.com, netkurd.com, avestakurd.net, nefel.com, azady.nl, serwext.com, 29.05.2009)*

www.arsivakurd.org

## BI SEDAN KURD TÊN RAGIRTIN

***Di destpêka Gulan 2009 de***, bi sedan Kurd li bajarên kurdî Sine, Merîwan, Kamyaran, Kermanşah, Pîranşah û Ilamê hatin ragirtin. Ew bi hevkariya PJAKê, şaxa îranî ya PKKê, ku li Kurdistana Îranê şerrê çekdarî dike, hatin tawanbar kirin.
*(netkurd.com, avestakurd.net, 12.05.2009)*

***Cardin di Gulanê de***, ji 60 kes bêtir li Merîwanê hatin ragirtin. Piraniya wan cuhanên ku bi beşdarbûna cêjna jinê ya 8ê Adarê, cêjna karkeran a 1ê Gulanê û xwepêşandanên din ên riswakirinê (protêsto) hatine tawanbar kirin in.
*(avestakurd.net, 24.05.2009)*

## BOMBEKIRINA KURDISTANA IRAQÊ

***Di 03 Gulan 2009 de***, topxane û hêlîkoptêrên îranî sê gundên sînorî, Kanî Masî, Jomarasî û Kara Sozî, yên Kurdistana Iraqê bombe kirin.
*(azady.nl, 03.05.2009; Milliyet, 04.05.2009)*

## BOMBEKIRINA KURDISTANA TIRKIYÊ

***Di 11 Gulan 2009 de***, topxana îranî dora gundê Kopekê, li nêzîkî Çolemêrgê (Hakkarî), li Kurdistana Tirkiyê, bombe kir.
*(netkurd.com, peyamner.com, 11.05.2009)*

## ZIMANÊ KURDÎ LI ZANÎNGEHÊN ÎRANÎ

***Di 27 Gulan 2009 de***, li gora ajansa îranî Mehr News, Encumena Bilind a Şoreşa Çandî, bi serokatiya serokê îranî, Mahmûd Ahmedî Nejad, biryar stend ku wêje (edebiyat), ziman û zaravên herêmî li zanîngehan bên hîn kirin.
*(netkurd.com, 27.05.2009; avestakurd.net, peyamner.com, serwext.com, 28.05.2009)*

## RAPPORA AMNESTY INTERNATIONAL

***Di Gulan 2009 de***, di rappora xwe ya 2009 de, Amnesty International Îran bi tundî rexne kir. Wê tê de da zanîn ku Kurdên Îranê di warê civakî û çandî de gelek hatine pelixandin û ku gelek caran Kurd bi endambûna PJAKê tên tawanbar û zîndan kirin, heta hukmê îdamê jî distînin.
*(serwext.com, 28.05.2009)*

********

******************

******************************

www.arsivakurd.org

## SÊ XWENDEKAR JI ZANÎNGEHÊ TÊN QEWIRANDIN

***Di 28 Nîsan 2009 de***, birêvebiriya zanîngeha Helebê biryar stend ku sê xwendekarên kurd, Alan Huseynî, Kawa Dîko û Ebdê Remê, biqewirîne ji bo ku ew di 12.03.2009 de bi rawestana bêdeng a 5 xulekan (deqqe) li hundirê zanîngehê beşdar bûn sersaliya 5mîn a serhildana kurdî ya 12 Adar 2004 !

*(amude.com, 13.05.2009)*

## ŞIRKETA OTOBUSAN TÊ CEZA KIRIN

***Di 01 Gulan 2009 de***, li gora Rêxistina Kurdî ya Mafên Mirov li Sûriyê, DAD, servîsên dizzî yên sûrî cezayê mehekê da şirketa kurdî ya otobusan, CIWAN, ji bo ku wê di Newrozê de beşdar biri bûn ciyê cêjnê !

Ji berê jî, çend şirketên hatûçûnê, weka Medya, Ciwan, Newroz, Roj, Dicle …, ji sedema navên xwe yên kurdî diviya bûn ku ceza bidin !

*(avestakurd.net, 01.05.2009)*

## 9 KURD TÊN RAGIRTIN

***Di destpêka Gulan 2009 de***, hêzên ewlehiyê li 4 gundên kurdî yên navçeya Efrînê gerriyan û tê de 9 kes ragirtin. Tukes sedema vê yekê nizane !

*(avestakurd.net, 09.05.2009)*

## BERPIRSIYAREKÎ KURD TÊ TAWANBAR KIRIN

***Di 11 Gulan 2009 de***, dadgeha 1mîn a cezayî ya Şamê berpirsiyarê partiya kurdî Teyyar El-Musteqbel, Meş'el El-Temo, bi 3 sal û nîv zîndan tawanbar kir. Ew bi *« pîçûkkirina dewletê, qelskirina hestê neteweyî û tevlihevkirina psîkolojiya netewe »*, li gora bend 285 û 286 ên zagona (qanûn) sûrî, hatiye tawanbar kirin.

*(amude.com, peyamner.com, 11.05.2009)*

## FÎLMEKE BELGEYÎ LI ALMANYA

***Di Gulan 2009 de***, Rêxistina ji bo Gelên di bin Tehlikê de "GfbV", ku li Gutingenê, li Almanya ye, li ser Youtoubê fîlmeke belgeyî li ser Meş'el Temo, serokê patiya kurdî ya sûrî, Teyyar El-Musteqbel, ku ji 11.08.2008 de li zîndanê ye û ku bi 3 sal û nîv zîndan hatiye tawanbar kirin, nîşan da. Fîlm bi kurdî ye û ji aliyê Dr. Kemal Sîdo hatiye çêkirin.

*(avestakurd.net, kurdistan-news.net, 21.05.2009)*

## DU SERBAZÊN KURD TÊN KUŞTIN

***Di Gulan 2009 de***, li gora Rêxistina Kurdî ji bo Parastina Mafên Mirov û Azadiyan li Sûriyê "DAD", du serbazên (esker) kurd dema ku xizmeta leşkerî li navçeya Efrînê, li Kurdistana Sûriyê, dikir hatin kuştin. Yê 1mîn, Xebat Şêxmûs, li goristana gundê xwe, Qiddê, hat veşartin. Ê 2mîn, Ehmed Se'dûn, ji gundê Kobra, bi êşkencê hat kuştin.

Ji dema serhildana kurdî di 12 Adar 2004 de, 18 serbazên kurd hatin kuştin.

*(peyamner.com, 23.05.2009; amude.com, 25.05.2009)*

********

******************

******************************

www.arsivakurd.org

# NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ

**XELATEKE AMERÎKÎ JI BO PIRTÛKEKÊ**
Derhatiyê Kurd-Cihû û welatvanê amerîkî, Ariel Sabar, pirtûkek bi ingilîzî “The paradise of my father” (Buhuşta bavê min), piştî seredana, bi bavê xwe re, welatê xwe yê eslî, Kurdistana Iraqê, nivîsî. Ev pirtûk di 2008 de Xelata Xeleka Neteweyî ya Pirtûkê stend.

Bavê Ariel, Yona Sabar, mamosteyê zimanê suryanî (araméen) li zanîngeha California, li Los Angeles, e.
*(azady.nl, 01.05.2009)*

**GUHERANDINA BERNAMEYÊN DIBISTANÎ LI KURDISTANA IRAQÊ**
***Di destpêka Gulan 2009 de***, wezîrê perwerdê yê hukûmeta Kurdistana Iraqê, Dilşad Abdul-Rahman, da zanîn ku wezareta wî bernameyên dibistanî ji pola (sinif) yekemîn a seretayî heta dawiya dibistana dawîn guherandin.

Wezîr got ku bernameyên nuh alîkariya xwendekar dikin ku karibe bûyeran tehlîl bike, dêlva ku wan ji ber bike (ezber).
*Peyamner.com, 06.05.2009)*

**KOMEKE KURDÎ YA MUZÎKA ROCK LI HOLLANDA**
***Di 05 Gulan 2009 de***, komeke kurdî ya muzîka rock, Çar Newa, ku ji Kölnê, ji Almanya hat, beşdar bû şahiyên cêjna neteweyî ya hollandî li Wegeningenê.
*(azady.nl, 07.05.2009)*

**KONFÊRANSEK LI HEWLÊRÊ LI SER DÊMOKRASIYÊ LI IRAQÊ**
***Di 07 Gulan 2009 de***, li Hewlêrê konfêransek bi navê “Ji Totalîtarîsmê ber bi Dêmokrasiyê”, bi beşdarbûna serokê Kurdistana Iraqê, Mesûd Berzanî, serokê parlementa Kurdistanê, parlementerên iraqî û kurd … bû.

Amanca konfêransê dabînkirina (te’mîn) aşîtiya neteweyî li Iraqê bû.
*(peyamner.com, netkurd.com, 07.05.2009)*

**KURDEK DIBE “DOKTORÊ PISPOR” Ê DADGEHEKE SWÊDÎ**
***Di 07 Gulan 2009 de***, servîsa çavdêrîkirina (kontrol) civakî (Sosyalstyrelsen) ya dadgeha swêdî ya Kammarrättenê, Kurdek, Dr. Cuwan Heqî, weka “Doktorê Pispor” li bal Dadgeha Dewletê “Länsträtten” nîşan kir.

Dr. Cuwan Heqî Kurdekî Tirkiyê ye. Wî bijîjkiyê (tib) li Bulgaristanê xwend û piştre doktorayek di psîkyatrî (psychiatrie) de li Swêdê stend. Wî lêgerînek li ser dînbûnê di 1994 de kir. Ew di heman (eynî) zemanî de endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêdê ye û ji 2000 de çend efsane nivîsîne.
*(serwext.com, 07.05.2009)*

**XELATEKE ALMANÎ JI BO FÎLMEKE KURT**
***Di 07 Gulan 2009 de***, fîlmeke kurt li ser zarokên kurd, “Şoreş û Şêrîn”, xelateke girîng a çapemeniyê, “European Young CIVIS Media Prize”, li Berlînê stend. Nivîskarê fîlmê, Serkal Kuş, kurd e û sênarîst, Katrin Gebbe, alman e.
Merasîm li parlementa almanî bû û ji aliyê kanala têlêvîzyona almanî, ARD, hat weşandin. Xelat 5.000 € ye.
*(amude.com, 08.05.2009)*

**PÊŞANGEHEK LI HOLLANDA**



***Di 08 Gulan 2009 de***, nimînendeyê Hukûmeta Kurdistana Iraqê li bal Yekîtiya Ewropî, Burhan Caf, li Amsterdamê pêşangeheke fotoyan a rojnamevanê hollandî Michael Hegener, bi amadebûna berpirsiyarên kurd, balyozê (sefîr) Iraqê li Hollanda, dîplomat û rojnamevanan, vekir.

Michael Heneger 50 fotoyên ku di dema şoreşa Îlonê ya serokê kurd Mustafa Berzanî de stendi bûn nîşan dan. Û wî pirtûkeke bi ingilîzî, bi navê “The Kurd of Iraq”, nivîsiye.
*(azady.nl, 09.05.2009; Krg.org, 10.05.2009; peyamner.com, 11.05.2009)*

www.arsivakurd.org

**FÎLMEK LI FÊSTIVALÊN NAVNETEWEYÎ YÊN ISPANYA Û ÎTALYA**

***Di Gulan 2009 de***, fîlma belgeyî "Mişk û Pisîk », a fîlmçêkerê kurd ê Îranê, Bîjen Zeman Pîra, li fêstivalên navneteweyî, li Ispanya û Îtalya, hat nîşan dan. Ew çîroka du zarokên ku li dora bajarê Sinê, li Kurdistana Îranê, kar dikin dibêje.

Ev fîlm di Çirî 2008 de jî li Îrlanda, li Fêstivala Navneteweyî ya Fîlmê, hati bû nîşan dan.
*(peyamner.com, 11.05.2009)*

**5 XELAT JI DU FÎLMÊN KURDÎ RE LI FÊSTIVALA CANNES**

***Di Gulan 2009 de***, 5 fîlmçêkerên kurd, Behmen Qobadî, Şahram Adilî, Ekrem Kîro, Babak Amînî û Ferat Okçuoğlu, beşdar bûn Fêstivala Navneteweyî ya 62mîn a Cannes, li Fransa.

Du fîlmên kurdî xelat stendin : « Sirta le gel ba da » (Pisepis bi ba re), ya Şahram Adilî, 3 Xelat stendin. Ew fîlmeke wezareta çandê ya Kurdistana Iraqê ye. Fîlma Behmen Qobadî jî, « Kasi Az Gorbehaye Iranî Xaba Nadaeh » (Tukes li ser pisîkên Îranê napeyive), 2 Xelat stendin.
*(rudaw.net, netkurd.com, 23.05.2009 ; avestakurd.net, nefel.com, 24.05.2009)*

Fîlmek ji bo zarokan, The Utopia, a fîlmçêkrê kurd ê Tirkiyê, Sait Ferat Okçuoğlu, çîroka merivê şkeftan ku cihana nûjen dibîne dibêje.
*(netkurd.com, rizgari.org, 11.05.2009 ; peyamner.com, 23.05.2009)*

**PÊŞANGEHEKE KELEPÛRÊ LI SWÊDÊ**

***Di 09 Gulan 2009 de***, pêşangeheke kelepûra kurdî (hunera dest) li muzeya Siktona, li nêzîkî Stokholmê, vebû.
Ew ji aliyê Navenda Kelepûra Kurdî, bi alîkariya têlêvîzyona taxî ya Suleymaniyê, Xak TV, hat pêk anîn. Vekirin bi amadebûna şaredarê Siktona, nimînendeyê balyozxana Iraqê, birêvebirê muzeyê, stranbêj Ezîz Weysî û jimareke swêdiyan bû.
*(avestakurd.net, 12.05.2009)*

**ÇÎROK BI 17 ZIMANAN**

Mamosteyekî kurd, Deniz Özgür Nergiz, ji Kurdistana Tirkiyê, projeyek bi alîkariya Kommisyona Ewropî pêk anî. Wî pirtûkeke çîrokan a 98 rûpelî bi 17 zimanan, ku ji wan kurdî, da weşandin : albanî, erebî, bosnî, almanî, ingilîzî, fransî, kroasî, kurdî, lingala, masêdonî, lêhî, romanî, sirbî, ispanî, çêkî, tirkî. Ew bê pere tê belav kirin.
*(serwext.com, 13.05.2009)*

**DOKTORA LI POLONYA**



***Di destpêka Gulan 2009 de***, Salah R. Seîd, Kurdekî Iraqê, doktora li beşa fîzîk, astronomî (zanîna stêrkan) û enformatîkê, li zanîngeha Jagiellonianê, li Krakovî, li Polonya, stend. Ew li wê derê ji 2004 de, li gora lihevkirineke di navbera zanîngehên Kurdistana Iraqê û Jagiellonianê de, dixwîne. Nimînendeyê hukûmeta Kudistanê li Polonya, Ziyad Reûf, di dema parastina têza wî de amade bû.
*(Krg-Polonya, 15.05.2009)*

**XELATA AŞÎTIYÊ LI LONDONÊ JI ROJNAMEVANEKÎ KURD RE**

***Di 11 Gulan 2009 de***, di kongereya Encumena Cihanî ya Agahdariyê li Londonê de, Xelata Aşîtiyê bi riya Agahdariyê ji aliyê Club Ethinom Westminster ji Dr. Bedir Xan El-Sindî, sernivîskarê El-Teaxî, rojnameyeke Kurdistana Iraqê bi zimanê erebî, re hat dayîn.
32 welat beşdarî vê kongrê bûn. 7 rojnamevan xelat stendin.
*(efrin.com, 26.05.2009 ; peyamner.com, 28.05.2009)*

**HEVKARIYA SÊ ZANÎNGEHÊN KURDISTANA TIRKIYE Û IRAQÊ**

***Di 13 Gulan 2009 de***, berpirsiyarên zanîngeha Artuklu ya bajarê Mêrdînê, li Kurdistana Tirkiyê, û yên Duhok û Kerkûkê, li Kurdistana Iraqê, lihevkirinek wajo (imza) kir. Li gora wê, ewê akadêmîkên Kurdistana Iraqê fêrên kurdî li zanîngeha Mêrdînê bidin. Bi ser de jî, ewê nêzîkî 25 xwendekarên Mêrdînê fêrên kurdî li zanîngeha Duhokê bistînin. Û ewê hevkarî di nav van zanîngehan de, di warên bername, karbidest û zanînan, hebe.
*(netkurd.com, azady.nl, 28.05.2009)*

**SEMÎNEREK LI SER ÎRANÊ LI PARLEMENTA FINLANDÎ**

***Di 14 Gulan 2009 de***, li parlementa finlandî, li Helsinki, semînerek bi navê « Kuştin û êşkence li Îranê » hat kirin. Parêzerê (avukat) girtiyên ramyarî (siyasî) yên kurd li Îranê, Xelîl Bahramyan, axaftineke dirêj li ser îdam û rewşa zîndanan li Îranê kir.
Parlementerên finlandî, çalakvanên mafên mirov, nimînendeyên partiyên ramyarî yên kurdî û finlandî û

www.arsivakurd.org

parêzer beşdarî vê semînerê bûn. Rewşa mafên mirov bi giştî û ya mafên Kurdan û jina kurd bi taybetî bi dirêjî hatin giftûbêj kirin.
*(avestakurd.net, 15.05.2009)*

**FÊRÊN ZIMANÊ KURDÎ LI ZANÎNGEHÊN ALMANÎ**

***Di Gulan 2009 de***, piştî zanîngehên Aachen û Dortmundê, fêrên zimanê kurdî li zanîngeha Siegenê, li Almanya, dest pê kir. Ew ji aliyê xwendekarên kurd bixwe hatine pêk anîn û ev xwendekar tecrube dikin ku fêr ji aliyên zanîngehan bên nas kirin.
*(netkurd.com, 16.05.2009)*

**FÊSTIVALA ZIMANAN LI INALCO, LI PARÎSÊ**

***Di 16 Gulan 2009 de***, beşa kurdzaniyê li INALCO (Enstituya Ziman û Şehreyariyên Rojhilatî), li Zanîngeha Sorbonê, li Parîsê, beşdar bû Fêstivala Zimanan « Festival des Langues' O Show ».
Xwendekarên welatên cihê, weka Kalêdonya Nuh, Hindistan, Birmanî, Çîn, Paraguay, Thaïlande, Cambodge, Brêzîlya, Mali, Rûsya, Korê, Îran û Kurdistan, stand « mase » vekirin û çanda xwe da nasîn. Kurdan dêfîleya cillên kurdî pêk anî û dîlanên kurdî kirin. Li « stand »a wan, nexşeya Kurdistanê, foto, xwarinên kurdî … hebûn.
*(netkurd.com, 19.05.2009)*

**MIRINA BILÛRVANEKÎ LI KURDISTANA ÎRANÊ**

***Di 21 Gulan 2009 de***, bilûrvanê navdar, Qele Mere, di 84 saliya xwe de li Bokanê, li Kurdistana Îranê, wefat kir. Ji zarokiya xwe de wî li bilûrê « şîşal » dixist. Berê çend mehan, wî di hevpeyvînekê de goti bû ku ewê bilûra xwe diyariya muzeya muzîkê ya Kurdistana Iraqê bike.
*(peyamner.com, rudaw.net, avestakurd.net, azady.nl, 22.05.2009)*

**KONFÊRANSEKE WÊJEYÎ LI KURDISTANA ÎRANÊ**

***Di 25 Gulan 2009 de***, Navenda Ehmedê Xanî li Urmiyê, li Kurdistana Îranê, konfêranseke wêjeyî (edebî) û felsefî pêk anî. Xwendekar, mamoste û helbestvanên kurd beşdarî wê bûn. Ev navend ji 2003 de ava bûye û kovareke ji bo jinan diweşîne, fêrên zimanê kurdî (zaravê kurmancî) dide û şano, konfêransan … pêk tîne. *(Kawe Dehpuyad, 29.05.2009)*

**FÎLMEKE BELGEYÎ LI SER MÎSYONÊN FILLE LI KURDISTANÊ**

***Di Gulan 2009 de***, fîlmeke belgeyî, « Kurdistan Mission », li ser çalakiyên mîsyonên (keşşe) fille yên rêxistina Luther li Kurdistanê ji aliyê şirketa ingilîzî Wist Production hat çêkirin. Ew ji 12 beşan ava bûye. Meriv dikare beşa pêşîn li malpera entêrnêt : www.scola.org/eonecommerce/portal bibîne. Û meriv dikare jî li malpera kurdî ya Îranê, Ruwange, ku gelek gotaran li ser çalakiyên mîsyonêran li Kurdistana Îranê di sedsalên buhurî de diweşîne, binêre.
*(avestakurd.net, 22.05.2009)*

**FERHENGEKE FRANSÎ- KURDÎ LI HOLLANDA**




***Di Gulan 2009 de***, Banû Nahid Raşîdyan, Kurdeke Îranê ku li Hollanda dimîne, ferhengeke kurdî-fransî û fransî-kurdî, ku her yek ji wan ji 20.000 gotin bêtir pêk hatiye, weşand. Di 2005 de, wê ferhengeke din, kurdî-hollandî û hollandî-kurdî, weşandi bû. Sedema baldariya wê ya mezzin ji zimanan re ew e ku ew bi girîngiya rola wan di nêzîkkirina gelên cihê de bawer dike.
*(Nahid Raşîdyan, Buroya Kurdî, 29.05.2009)*

**NÎŞANA RÛMETÊ LI ALMANYA**

***Di 28 Gulan 2009 de***, di merasîmekê de, şaredarê Kreuzbergê, li Berlînê, Dr. Fransz Schulz, nîşaneke rûmetê da çalakvanê Kurd ê Tirkiyê, Riza Baran, ji bo xebata wî ya civakî bi derhatiyan (immigrés) re.
Riza Baran endaz (muhendis) e û di 1963 de hati bû Almanya. Wî li zanîngehên Hannover û Berlînê xwend. Lê, dêlva ku di warê xwe de kar bike, wî fêr dan cuhanên biyanî. Ew ji 1978 de endamê partiya almanî ya Keskan e. Ji 1995 heta 1999, bû endamê parlementa Berlînê û ji 2001 heta 2006 bû serokê encumena şaredariya Kreuzbergê.
*(netkurd.com, 30.05.2009)*

BRUSSELS HOOFDSTEDELIJK GEWEST
VLAAMSE GEMEENSCHAPSCOMMISSIE

*Ev bulten bi alîkariya Vlaamse Gemeenschapscommissie (VGC), bi 4 zimanan hatiye weşandin : kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî.*



www.arsivakurdi.org